

Her kes wisa difikire, ku tu tişt ne hatiye kirin, û gerek 'ez ji pêşî de dest pê bikim'. Ev yek ne rast e. Gerek mirov bigere, bixwîne û bibîne ka çi heye û kêmasî çi ne. Wek mînak, gava Kurd li ser internête nameyan ji hev re dişînin, her yek bi awayekî dinivîsîne. Bila her kes li hev bike, ku li gor rastnivîsîna zimanê kurdî binivîsîne.

Tu li ser gramera Mîra Celadet Bedirxan çi dibêji? Kurd dikarin wêwekebingeh ji xwe re bi kar bînin?

Ez wê pirtûkê bi kar tînim. Lê dîsa jî ew wek Quran nîne, ew ne wek kitêba pîroz e. Şaşitî û kêmanî tê de hene. Ew destpêka rê bû. Bê guman, di destpêkê de wê kêmasî hebin. Lê dîsa jî pirtûkeke gelekî giring e. Pirtûka pêşîn, ku min berî 20 salan bi dest xistibû, ew pirtûk bi xwe bû. Ez wê dîsa jî bi kar tînim. Gelek tiştên sivik tê de hene, ku gerek em îro zelaltir bikin. Bi giştî ez başdibînim, ger mirov wê pirtûkê weke bingeh bi kar bîne.

Berî demekê ferhenga te ya kurmancî-ingilîzî derket. Armanca te ji vê xebatê çi ye?

Berî 16e salan, dema ku min dest pê kir, ku xwe hînî zimanê kurdî bikim, pir jêder tune bûn. Ji ber vê yekê, min dest bi amadekirina ferhengekê kir, da ku ez xwe bi xwe fêrî kurmancî bikim. Piştî min dît, ku bi rastî ev yek dikare bê çap kirin, da ku berjewendiyên wê bigihên her kesî.

Ez hêvîdar im, ku ew ji bo standardkirina kurmancî jî bête qebûl kirin.

Herweha dema min dest bi hînbûna kurdî kir, ferhengên kurmancî-erebî, -

kurmancî-tirkî, kurmancî-rûsî hebûn, lê bi rastî kurmancî-ingilîzî tune bûn. Îro 3

4 ferhengên kurmancî-ingilîzî hene. Bê guman, zimanê ingilîzî îro gelekî giring e, ne tenê ji bo Kurdan, lê ji bo armancê. Herweha ji ber ku kesên, ingilîzîaxêvan jî. Ji bo Kurdan çêtir e, ku ew gel mesela Kurdan fêm bike. Û ger jêder û çavkaniyên bi zimanê ingilîzî hebin, dê rê xweşbikin ji bo gihiştina vê

biryardar di cîhanê de bi ingilîzî dizanin, dê çêtir be, ku jêderên li ser Kurdan bi ingilîzî hebin. Ez kêfxweşnînim, ku hêz di destê ingilîzaxêvan de ye, lê rastî ev e; ez nikarim vê rastiyê biguherim.

Te yê bixwesta ku hêz di destê kê de ba?

(dikene) Ez siyasetvan nînim; ez zimanzan im.

Ti projeyên te yên din ji bo zimanê kurdî hene?

Belê, hene. Pirtûkên min ji bo hînbûna kurmancî û soranî hene. Herweha pirtûkeke min a din bi navê 'Antolojiya Edebiyata Kurdî' bi zimanê ingilîzî heye. Ew ta niha hîn çap nebûne. Min hîn çapxane ji bo wan peyda nekirine. Ez hêvîdar im ku piştî derketina ferhenga min, rê ji bo vê yekê xweşbibe.

Tu dixwazî tişteki li gotinên xwe zêde bikî?

Dixwazim bi vê dirûşmê gotinên xwe bi dawî bînim:

'Zimanekî wisa ku zarok pê nepeyivin, zimanekî bê paşeroj e!'

Gelek sipas ji te re ji bo vê hevpeyvînê. Em ê mesaja te bigihînin dê û bavên Kurdan.

Mala te ava!